«ACCOMPAGNA»:Zêdekirina derfetên perwerdeyê ji bo zarokên malbatên penaberan:

Dema destpêka sinifên normalên dibistana bingehî ya Volksschule, zarokên malbatên penaberan ji aliyê xwendevanên zanîngeha Pedagojî ya St. Gallen (PHSG) tên piştgirîkirin.

Projeya «ACCOMPAGNA» çi ye?

Di projeya «ACCOMPAGNA» zarokên malbatên penaberan ji aliyê xwendevanên zanîngeha Pedagojî ya St. Gallen (PHSG) tên teşwîq kirin. Ji bo şeş heyvan, mamosteyan serdana zarokan dikin li avahiya dibistanê. Carekê di hefteyê de, her zarok bi serê xwe li mijarên dibistanê de tê piştgirîkiirn. Armancê vê proje ewe ku alîkar be ji bo zêdekirina derfetên perwerdeyê ji bo zarokên malbatên penaberan.

Kîjan zarokan dikarin beşdar bin?

Zarokên malbatên penaberan û zarokên penaber ku bitenê ne û diçin dibistana seretayî li rojhilatê Swîsreyê dikarin li projeya «ACCOMPAGNA» de beşdar bin.

Çi tê teşwîqkirin?

Hene …

- Stratejîyên fêrbûnê tên diyarkirin, da ku zarok bikaribin bi serkeftî wekî mimkin e li dibistanê fêr bibin.
- Erkên kilasê dersê û erkên malê tên nîqaşkirin.
- Mijarên zarok di jiyana dibistanê ya rojane (wek mînak, bernama rojê, perçekirina mijaran û nirxandinan) tên şirovekirin.

Xwendevanên mamoste bi şert û mercên zarokan re difikrin û pêdiviyên wan tên dîtin. Piştgirî ji bo pêdiviyên şexsî yên zarokan bi mamostayê sinifê re tê niqşkirin.

Piştewanî û alîkarî kengî û li kî derê bê lidarxistin?

Her zarokek carekê di hefteyê de tê alîkarîkirin. Di sala xwendinê de, ser hev re dora bîst civînan dê cihgirin. Destpêka projeya û dîrokên hevdîtinê ji bo her kesekî bi cuda tê dîyarkirin. Projeya «ACCOMPAGNA» di heyva tebaxa 2016 de tê destpêkirin û tevlêbûn bi projeyê di her demekî de mimkin e. Piştewanî û alîkarî kirin di dema dibistanê de li dibistanê ya zarok tê birêveçûn. Xwendevanan ji aliyê PHSG re bi baldarî ji bo karên xwe tên amade kirin.

Mesrefa beşdariyê di projeya «ACCOMPAGNA» çi ye?

Ji bo dê û bavan û dibistanan ev proje bêpereye. Civakên dibistanê, avahîyên pêdivî mimkin dikin. Projeya «ACCOMPAGNA» ji aliyê PHSG û daîreyekî întegrasiyona Federalê (Sekreteriya Dewletê ji bo koçberiyê) û herwisa binyada Paul Schiller li Zûrich tê fînanse kirin.

Zarokek çawa bê qeydkirin?

Piştî şêwirînê bi prensîbên rêveberiya projeyê, rêveberiya xwendegehê an mamosteyan dikarin zarokek an jî çend zarokan ji bo beşdarîkirina di projeya «ACCOMPAGNA» de qeyd bikin. Dê û bavên zarokan dikarin tevlêbûnê çê bikin bi mamosteyê sinifa zarokên xwe.

Têkilî

Rêvebirê proje:

Prof. Dr. Sonja Bischoff, Pädagogische Hochschule St.Gallen, Notkerstrasse 27, 9000 St.Gallen, accompagna@phsg.ch, T +41 71 243 96 22
blogs.phsg.ch/accompagna/